DUHÎ Û EVROYA PIRSA KURDÎ Û KERKÛKÊ

Nivîsîna: Zahir Rojbeyanî
Veguhaztin bo latînî:
Loran Adem

Hukmeta Berîtanî belên dabû hukumeta îraqî, ku heta 1932 dewleta Îraqê bike endam di (komela milletan) de.

Ji bo bicihînana vê belênê peymaneke nû di navbera her du hukmetan de pêdivîbû. Bi merema destveînana vê peymanê jî, ku piştî hingê bi (peymana 30 xizîranê 1930) hate niyasîn, Nûrî Seyîd, yekem wezareta xwe li ser rasparda melik Feyselê yekê pêkîna, ku roja 23/3/1930 destnîşan kirbû.

Nûrî Seyîd bo çespandina hukmeta xwe û derbazkirina ewê peymana çaverêkirî, hijmareke pêngavên bi nav çaksazî havêtin, ewên li ser astê îraqê û erebî bû. Me ew dem nîne li ser rawestin, lê ewên ku peywendî bi Kur-

distanê ve hene, ev hindek in ji wan:

* 10 ê nîsana 1930 ê , bi beyannameyekê ragehand ku hukmeta wî di kombûna bihêt ya meclsa umme de, dê pirojeyekê derbarey ziman û xwandina kurdî li deverên (şîmal) de danite berçav..

* Rêveberiya perwerdeya Hewlêr û Mûsil û rêveberiya perwerdeya Silêmaniyê li bexda cuda kirin û li kerkûkê jî dayreka mearif bo hemû deverên kurdinişîn damezirand û mamostayekê kurd kire mufetîşê wan deveran.

* Li ser astê bernameyên xwandinê jî, hindek pirtûkên cugrafiya, mêjû, ayîn, zanist û hindek tiştên din jî kirine kurdî.

* Li wî demî li kerkûk heftînameke mîrî bi navê (Kerkûk) bi tirkî der dikevt, demê Nûrî Seyîd hate ser karî, (4) rûpel jê kirine kurdî.

* Du stêr êxistine ser dirûşmê Îraqê weku sumbulek bo kurd û ereban.

* Kesatiya berniyasa kurd Tewfîq Wehbî kire muteserifê Silêmaniyê û (Ebdil Hemîd Ebdil Mecîd) jî kire muteserfê Hewlêrê û çendîn kesatiyên din jî pileyên îdarî û darayî pê raspardin, weku Salih Zekî û Xelef Şewqî û Macid Mustefa û... Dan û standinên di navbera îraqê û berîtaniya bo girêdana peymana 30ê hizîrana 1930 dest pê kir, li 30/6/1930 hate îmzakirin, hefteyekê berî morkirinê melik Feyiselê yekem li 23/6/1930 geştek bir ewropa.

Li 1/7/1930 serok wezîran Nûrî Seyîd geştek kir bo ewropa, lê ew peyman li 18/7/1930 bi resmî ragehand.

Siyasiyên berniyasên îraqî derbarey Reşîd Elî Geylanî, Hikmet Sileyman, Tewfîq Soydî, Kamil Çadirçî, Cefer ebu Timen, Mizahim Paçeçî û çendên din jî gelek bi dijwarî dijî wê peymanê rawestan. Belê, ji aliyê gelên Kurdistanê ve karesat ji wê jî raste û xurtir û karîger bû, çunku ewê peymanê çi amaje bo mafên gelê kurd tê de nebû... Bi vî rengî li hemû derên Îraqê bo hera, bi taybetî li Kurdistanê, li Silêmanyê û Kerkûkê. Demê melik çûye seferê erşê Îraqê teslîmî Xazî yê kurê xwe kir ku welîehid bû, Nûrî Seyîd ku çûbû Berîtaniya, Cefer Eskerî yê zava û xezûrê wî li cihê xwe dana bû, ku wezîrê bergiryê bû di hukmeta wî de, herweha sêr hemxîzî mendûbî samî berîtanî jî ku bo hûrdekaryên peymanê çûbû Berîtaniya, mêcer Bong li cihê xwe dana bû di gel belavkirina

deqê peymannamê, ev sê wekîl e rû bi rû nerazîbûna xelkî bûn. Li Silêmanyê Heme axay û Rehman axa, şêx Qadirî Hefîd, Reşîd Necîb, Zet begê Usman paşa û welatiyan (heyeta wetenî) damezirand û hinartina yadaşt û birosikan ji Silêmanyê û Kerkûkê dest bi geşe kir. Emîr xazî kurê melik Feyisel û welî ehdê erşê wî li 16ê tîrmeha 1930 seredana Kerkûk û Silêmanyê kir bû. Hukmeta Îraqê jî li 5/8/1930 şandekê bala bo seredana Kurdistanê û hawîşikirina xelkê wê pêk îna, ku pêk hat bû ji serokê hikometê bi wekalet Cefer Eskerî, wezîrê navixwe Cemîl Medfey û wezîrê dad Cemal Baban, bi hevalîniya wekîlê mendûbê samî yê Berîtanî li Îraqê . Ev şande li roja 8/8/1930 gehişte Kerkûk û li 9/8 ji wêrê berev hewlêr û 10/8 çûne Silêmanyê, serokê hukmeta îraqî bi wekalet Ceifer Eskerî û mendûbê samî yê Berîtanî bi wekalet li hersê bajaran digel mezin û cemawerî kombûn û peyama dewleta Îraqî û Berîtanî bi vî rengî gehande xelkî...

Serokê hukmeta Îraqî bi wekalet Cefer Eskerî: Min hindek birosk û erîzên hindeka xwandin ku nerazîbûna xwe derbirî ye li ser hindê ku behsê pirsa kurdî di peymannameyê de nehatî ye... Min divêt bigehînme hewe ku hukmeta Îraqê bi rijde li ser wî bernamey ji bo piştrastkirina biryarên kurd danay.. Belê hukmeta şkudara melik Feyiselê yekem gelek bi dijwarî ya rijde li ser binibirikirina her nezeyeka ziyanê bigehînte yeketiya nîştimanê Îraqê yan ewê hevsûya germ û gura di navbera herdu hikometên dost Tirikiya û îranê de têk bide... Paşî wekîlê mutemedê samî berîtanî pêşkêş kir, ewî jî ev çend e û gelek tiştên din tekîd kirin (hukmeta îraqî ya amade ye û pêxweş e cudahî dinavbera reiayên şkodar melik Feyisel, kurd û ereban de neke, ewa li dev hukmeta Berîtaniya cihê pûtedana yekê ye, ew e ku damezirandina dewleteke serbest û azad bo Îraqê misoger bike... Piştevaniya hîç bizavekê nake, eger diyar bû ku di gel vê siyasetê nagunce, wek xwasta cudabûna kurdan, min hindek aliyên nemesul jî dîtin, weha hizir dikin siyaseta dûmahyê ya hukmeta şkodara Berîtaniya handana bizava nîştmaniya kurdî ye, eve jî her bo helingivtina hukmeta Îraqê bi tenê nîne, belku ji bo helingivtina herdu hikumetên xweştivyên hevsû, Tirkiya û Îranê jî ye...) li Silêmanyê bi xwepîşandana û hinartina biroska û yadaştinamên heyeta wetenî û kesanyên beriniyas pêşwazî li van

buçûnên serok wezîrên îraqî bi wekalet û wekîlê mutemedê samî berîtanî hate kirin, ev kare heta roja 6/9/1930 û şerê bi nav û dengê ber dergehê serayê, û piştî hingê jî berdewamî hebû... şandê bala yê hukmeta Bexda demjmêr 10 î spêdê li roja 8/8/1930 bi balefirekê gehişte Kerkûk, kesanyên berçav û endamên perlemanî û bazirgan û fermanber û serok hêz û cemawerekê zor li avahyê (qişlê) li pêşiwaziya wan bûn, ko serok wezîran bi wekalet û mendûbê samî yê Berîtanî bi wekalet, ew axiftin kirin, ku dengê nerazyê di nav xelkî de bilind bû, di gel endamên şandê balayê Bexda, û ew çê bû ewa rojnama jiyan, hijmar 257 ya roja 14/8/1930 bi dûr û dirêjî amaje pê kir bû, di wê girjbûnê de, weke rojnama jiyan dibêjît, bi hijmar bi tenê (4) kes di gel hindê bûn ko Kerkûkê bêxine ser Îraqê û bajarên Hewlêr û Silêmanî bihêne cuda kirin, ew çiwar kese jî eve bûn:

Ebdela Safî Efndî, turkman bû.

Mustefa Safî Efndî Yeiqobî, ku birayê wî bû.

Faris Axayî Beyatî, ku digutin erebe, lê dirastî de beyat turkên azerîne û, li devera Silêman beg dijîn.

Şêx Muhemed Hebîb Efndî, ku rojnama jiyan dibêjît, (çunkî Qazî û memure mecbure), jiblî van kesê dî piştevaniya hindê nekir, ku Kerkûkê ji Silêmanyê û hewlêrê cuda biken û bêxine ser îraqê . Ew kesên beriniyasên kurd jî ku divê kombûna cemawerî de bergiriya ji hejî ji Kurdistanî bûna Kerkûkê kirîn, gelek bûn: Mihemed begê Caf, Seyîd Ehmed Efendî Xaneqa, Seyîd Mihemed Efendî Cebarî. Bigire û fekêşê dirêje pê hate dan heta kar gehiştî ye hindê, serok wezîran bi wekalet Ceifir Eskerî rabît û bêjite Mihemed begê Caf: (bi şerefa hukmetê û min te pişt rast dikem ku bi temamî muqereratên esbet el omem dê bo hewe bi cih înîn ev lîwayejî dê mifay jê bînît)

Hejî amaje pê kirinê ye, ku xelkên Kerkûkê li rapirsîna 25/2/1925 ya (esbet el omem) de deng neda hindê ko Kerkûkê bêxine ser dewleta Îraqê . Herweha li demê hewa beya melik Feyiselê yekê jî de, ku li tebaxa 1921 ê hatiye kirin, dîsan xelkê Kerkûkê mubaya melik Feyiselî ret kirin, ko herîyekê ji van rûdana dirêj yên xwe hene, lê pirsiyar ew e, erê evro û duhiya pirsa kurd û belên û peyman û helwîst û peywendiyên kurd û ereb û îngilîz û turik û îran û hemû aliyên pirsa kurdî, piştî nêzîkî 70 –80 salan çi gorankarî bi ser de hatî ye..?!

Jêder:
Rojnama Xebat 9/8/2004